YEKÎTÎYA EWRÛPAYÊ Û ENDAMETÎYA TIRKIYÊ

Ayşe Güler

Ev mesela ha, di warê sîyasî, abûrî, çandî û ciwakî de qasî ku Tirkiyê alaqadar dike kurdan jî alaqadar dike.

Yanî ev mesela ha ne tenê mesela Tirkiyê ye. Ji bona çareserkirina pirsa kurd YE (Yekitiya Ewrûpayê) ji bo me kurdan girîng e. Di van demên dawîn de mijara endametiya Tirkiyê ya YE rojevê zêde zêde mijûl dike. Li Tirkiyê yasayên lihevkirinê derxistin, di çerçewa YE de hinek guhartin hatin kirin. Lê înkarkirina pirsa kurdî di rastiyê da ne hatiye guhartin. Hebûna gelê kurd hîn jî bi awayekî fermî nehatiye qebûlkirin. Ji bona çareserkirina pirsa kurdî tu gavên ku tên daxwazkirin nehatine avêtin. Hîn jî bi zimanê kurdî weşan û perwerde bi sînor e.

Bi rastî jî niqaşkirina mesela kurd bê ka "kêmnetewe" ye yan na, bi min pir seyr e. Ji ber ku dunya û alem dizanin ku gelê kurd ne "kêmnetewe" ye, ew bi dîrok, ziman û çanda xwe neteweke serbixwe ye.

Berî her tiştî divê dewletên YE pirsa kurdî di sewîyeke bilind de niqaş bikin. Lê mixabin em dibînin ku îro ev sewiye pir nizm e. Dîsan mixabin ku dewletên YE gelê kurd bi awayekî fermî ne wek teref û ne jî wek xwediyê pirsê qebûl dike

Ev pirs, pirsa me ye, divê ew ne bi komara Tirkiyê re çareser bike, divê teref em kurd bin.

Bi bîr û raya min divê Tirkiye hin hengavina baveje ji bona bicihanîna pîvanên Kopenhagê û bide xuyakirin ku ew guhartin çêbûne paşingê jî bona endametiye dikarin li hev rûnin.Yanî YE gerek vê wek erk û mercekî deyne ber komara Tirkiyê.

Em kurd wek rêxistin, dezgeh yan jî ferd, ji bona çareserkirina pirsa kurdî, çî têkeve ser mile me, divê em texsîr nekin.

Bi destxistina mafên demokratîk tenê bi endametiya YE wê bibe. Kurd wek gelên din yên dunyayê divê xwedî hemû mafên demokratîk bin.